

Em dixwazin bi azadî û bi rûmet bijîn!

Em naxwazin li kampa Hesepe, ya ji jiyane dîr, bijîn !

22. September 2011

Em berê xwe didin we, ji ber ku em êdî nema dikarin di nav van şert û mercan de, yê ku li ser me hatine ferzkirin, bijîn. Em penaberên kampa Hesepe Bramsche ne. Ev kampa penaberan li Niedersachsenê ye, ji Osnabrückê 24 km û ji Hesepe 4 km dîr e. Herweha buhayê çûna Osnabrückê 5,40 € ye û di kampê de derdora 700 pemaberî dijîn.

Ev kampa ku berê cihê wargeheke leşkerî bû, bi tîlên rêsayî dorpêçkirî ye û bi riya hêzên ewlekariyê tê parastin. Di van mercên giran de, em di odeyan de hatine bicihkirin, ku hinek ji me şeş kes di yek odê de dimînin.

Berpirsiyarên Niedersachsenê ku ev kamp bi awayekî çêkirine ku ji her kesî û ji her tiştî dîr be. Li vê kampê cihê polîsên biyaniyan heye, cihê alîkariya civakî, cihê bijîjkî û dermankirinê, bexçeyê zarokan û dibistanek ji bo zarokên heta bi duwazde salî. Ji bilî kaveteryayekê navendî. Herwisa nasnameyên taybet li me hatine belavkirin, ku ji hêla birêveberiya kampê ve weku nasnameyên niştecihên kampê têne binavkirin. Gelek ji me, salên dirêj, li paş tîlên rêsayî û bi awayekî ku mirov ji civakê dîr be, li benda birêveçûna doza penaberiyê dimînin.

Em ji welatên cuda hatine: Efganistan, Deştê Acê, Ghana, Iraq, Hindistan, Îran, Yugoslaviya berê, Libnan, Kamîron, herêma Kafkasyayê yê girêdayî Rûsyaya îro, Sûriyê û Turkiyê. Me her tişt li pey xwe hişt, da ku em jiyanekê ewlekar, aştîyane û birûmet bidestbixînin. Me tu caran bawer nedikir ku em neçarî mana di kampeke weha de bibin. Roj bi roj baweriyê me zêdetir dibe ku ev kamp bi awayekî hatiye avakirin û birêvebirin ku mirov ji rûmetê bêpar bihêlin. Wisa mîna lawiran, mîna heywanan, dixwazin ku mirov ji taybetiyên mirovahiyê dîr bixînin. Ev mercên dijwar mirov bêçare, qels û nexweş dixînin. Hetanî ku dê hinekan ji me dîn bibin. Ev yek jî dibe sedem ku mirov nikaribe ne baş razê, ne jî baş bixwe. Herwisa ev rewş dibe sedema mirina zarokên me yê ku ji hêlekê de bi tîlên rêsayî û ji hêla din de bi hêzên ewlekariyê dorpêçkirî ne.

Her yek ji me, mehê çil euro digihêjê. Lê hinek ji me ji vê yekê jî bêpar dimînin. Hinek ji me dikarin karê “yek-euro” bikin, hem ji derve û hem li hundirê kampê bi karê paqiyê radibin. Piştî girtina kampa penaberan ya Oldenburgê hinek ji me ji bo kampê din hatin şandin û hinek jî li Hesepe û Bramsche neçarî karê nav goristanan bûn. Ji aliyekî de, em nikarin destûrwerigirtina karkirinê bidestbixînin û ji aliyê din de em neçarî karê pir erzan dibin. Em dixwazin kar bikin. Em dikarin xwe bi xwe û bêyî ku em destên xwe li ber kesekî vekin, jiyanê xwe bi awayekî baş birêvebibin. Çavên gencên me li pey azadiyê ye û em jî li pey jiyanekê azad û birûmet in. Pêdiviya me bi xwarina li kavetîryeyê nîne. Bi vî şêweyê heyî mirov ji bo bidestxistina gepa nan tê biçûkxistin. Pirê caran, em birçî dikevin xewê, ji ber ku ew nanê êvarê ku li kavetîryeyê tê dayîn, bi şev tîra mirov nake. Li vê kampê, ji bo hemû êş û nexweşiyên penaberan tenê du derman hene: ew jî Paracetamol û Ibuprofen in. Gelek ji me li kampê tûşî êş û nexweşiyên giran dibin. Lê dîsa jî, eger pêdiviya mirov bi dermankirinê çêbibe, yan bi derengî dibe, yan jî destûrwerigirtina şandina cem bijîjkan, nayê bidestxistin. Gelek ji xwişk û birayên me, yan li welatên xwe, yan jî li ser rêyên koçberiyê yê dijwar, raserî nexweşiyên derûnî, psîkolojîk, hatine, êdî ne gangaze ku di nav van mercên zehmet de ji wan nexweşiyên rehet bibin. Ev kamp ne ew cihe ku ew nexweşî lê bêne dermankirin yan jî sivikkirin.

Ji bo danûstendina li ser van pirsgerêkan, zêdeyî carekê, me xwestibû ku bi berpirsiyaran re biaxivin, lê li daxwazên me nehatibû guhdarîkirin. Birêz Conrad Bramm her gav rê li ber hewildanên me yê hevdiyan digirt. Me ji wî û hevkarên wî dixwest ku guh bidin gilî û daxwazên me, lê wan bi awayekî cidî guh nedidan xwestekên me. Ji ber wê bû, me pirotestoya meha Sibate lidarxist. Di axavtineke xwe de birêz Bramm di nûçeyên televizyona OS1-TV de gotibû; ku hayê wî ji gilî û daxwazên me tune. Herwisa gelek ji hevalên me yê çalak xistin bin zor û çewisandinê.

Di 21.09.2011 de, gelek kesan ji me, yê ku ev demeke dirêje li kampa Hesepe dijîn, derfetên karkirinê ji dest dan. Me xwest ku em bi birêz Bramm re hem li ser vê mijarê û hem li ser karê erzan, biaxivin. Lê, li şûna axavtinê, polîs bi ser me de hatin. Em pirotesto dikin, da ku hemû daxwazên me yê rewa cihbich bibin. Em ê pirotestoya xwe dewam bikin hetanî ku ev armancên me bêne pêkanîn:

Hemû penaberên ku li bajarên Niedersachsenê dimînin, li malan bêne bicihkirin. Bi vî awayî hem mesrefa dezgehên dewletê yê tîkildar kêr dibe, hem jî mercên jiyanê me baştir dibin.

Jiholêrakirina mana bi zorê, da ku em nehisin ku em di girtîgehan de ne.

Dana destûrwerigirtina karkirinê ji bo wan kesên ku dixwazin û dikarin kar bikin.

Penaberên kampa Hesepe li Bramsche

Ji bo têkiliyê:

Fofana, 0174 519 70 44 (elmanî û firensî) | Ghazanfar, 0176 36 95 76 84 (farisî) | Saeed, 0152 232 05 259 (ingilîzî û farisî)